

# Bielefeld

## Pêşniyarên ji bo qeyîdkirina jidayîkbûna zarokê li cem daîreya zewacê (Standesamt Bielefeld)

Her zaroka ku li Bielefeldê ji dayîk dibe, gerek di nava heftiyekê de li daireya zewacê (Standesamt) ya li Bielefeldê were qeyîd kirin. Ji bo vê yekê, nexweşxane belgeyê bi agahiyên di derbarê jidayîkbûna zarokê de amade dike. Pêwîste di nava heftiyekê de ew belge ji hêla dê û bav ve were îmzekirin. Berî hûn belgeyê îmze bikin, lazim e, hûn bala xwe bidinê ka her tişt rast hatiye nivîsandin an na.

Ji kerema xwe, kaxezên xwe yê hewce bidin nexweşxanê, da ku ew bikaribin her tiştê lazim ji bo Standesamt amade bikin. Servîsa posteya nexweşxanê, wê belgeya jidayîkbûnê bi tevî kaxezên we yê din bibe ji Standesamt re, ji bo ku zaroka we were qeyîdkirin. Di dawiyê de, eger karê qeyîdkirina zarokê û veghuestina dokumentên we bi dawî bûn, wê careke din hemû pelkên we li we werin vegerandin. Eger hûn bixwazin hûn dikarin belgeyên xwe ji Standesamt jî bistînin. Di vê rewşê de, Standesamt wê telefonî we bike û ji we re bêje ka kengî hûn dikarin kaxezên xwe bistînin. Heger hûn bi xwe bixwazin belgeyên xwe radest bikin ji kerema xwe bala xwe bidin ser saetên vekirî yê Standesamtê. Duvre, piştî çend rojan wê bi reya telefonê ji we re were gotin ka kengî hûn dikarin kaxezên xwe bistînin. Ji bo ku hertîşt bi awayekî hêsan bimeşe, em ji we rica dikin ku hûn hemû belgeyan bidine nexweşxanê.

Kîjan belge ji we werin xwestin, ev yek girêdayî rewşa we ye, ka dê û bav zewicî ne an na û herwiha hemwelatiya (cinsiye) dê û bav ya kîjan welatî ye.

### Belgeyên ku ji bo belgeya jidayîkbûnê pêwîst in

#### Dema dê û bav zewicî bin:

- Nasname an jî passaporta dê û bavê zarokê (ger cihê runiştinê ne Bielefeld be, wê demê li şûna nasnameya nû, belgeya rûniştinê ya bajarê ku lê qeyîdkiriye lazime (Meldebescheinigung))
- Fotokoyek ji pirtûka malbatê (Familienbuch) ku ji aliyê daîreke fermî hatibe morkirin, an jî
- Belgeya zewacê û belgeya jidayîkbûna dê û bav ku piştî 01.01.2009 li derveyî an jî hundirî welat zewicî ne
- Ger nav hatibin guherandinê, divê ev belge jî hebe
- Belgeya nexweşxanê ya derbarê jidayîkbûna zarokê de ku ji aliyê dê û bav ve hatiye îmzekirin

#### Dema dê û bav nezewicî bin:

- Nasname an jî pasaporta dayîka zarokê (ger cihê runiştinê ne Bielefeld be, wê demê li şûna nasnameya nû, belgeya rûniştinê ya bajarê lê qeyîdkiriye lazime (Meldebescheinigung))
- Belgeya jidayîkbûnê ya dayîka zarokê
- Ger dayîk berî niha carekê zewicî bû û dawî li zewacê xwe anîbe, belgeyên di vî warî de
- Ger navê xwe guhertibe, belgeya di vî warî de
- Ger belgeya qebûlkirina bavîtî hebe (ger belgeya qebûlkirina bavîtî hebe, nasname an jî pasaporta bav û herwiha belgeyên wî lazim in!)
- Ger hebe, belgeya mafê xwedîkirina zarokê
- Belgeya nexweşxanê ya derbarê jidayîkbûna zarokê de ku ji aliyê dayîkê ve hatiye îmzekirinê. Ger mafê bav jî ye xwedîkirina zarokê heye, îmzeya bav jî lazim e

Hemû belge divê orjînal bin. Ger belge bi zimanekî biyanî bin, divê bi almanî werin wergerandin.

**Di hinek rewşan de, dibe ku belgeyên din jî pêwîst bin.**

## Paşnav û navê zarokê

### Paşnavê zarokeke alman:

Zarokek alman, dema dê û bavê wê zewicî bin, paşnavê hevbeş yê dê û bavê xwe distîne. Ger paşnavê hevbeş yê dê û bav tine be, wê demê divê ji bo paşnavê biryar bidin. Ev yek ji bo hemû zarokan derbas dibe.

Ger dê û bav nezewicî bin û ger tenê mafê dayîkê yê xwedîkirina zarokê heye, wê demê zarok ji roja destpêkê ve paşnavê dayîka xwe distîne. Lê belê, ger dayîk bixwaze ew dikare paşnavê bavê zarokê ku ne xwedî mafê xwedîkirinê be jî, li zaroka xwe bike. Li gorî qanûnê, divê pêşî navê bav were dayîn. Herdu daxuyanî (navlêkirin û qebûlkirina wê, divê bi fermî werin morkirin) û pêwîste mirov bixwe biçe daîreya zewacê (Standesamt). Heqê ji bo navlêkirinê 30,- euro ye.

Ger dê û bav ne zewicîbin û herdu xwedî mafê xwedîkirina zarokê bin, dê û bav dikarin li ser paşnavê wan li hev bikin. Ev yek ji bo hemû zarokên din jî derbas dibe.

Ger nasnameya dê an jî ya bav biyanî be, ew dikarin di vê çarçoveyê de paşnavê hilbijêrin. Ji bo vê yekê, divê dê û bav beriya jidayîkbûna zaroka xwe, daxuyaniyeke ne fermî bidin.

### Paşnavê zarokeke biyanî:

Paşnavê zarokê bi giştî girêdayî mafê wê dewletê ye ku girêdayî wê ye. Li gorî vê yekê daîreya zewacê (Standesamt) li gorî mafê dewleta biyanî ku jê ne, paşnavê di belgeya jidayîkbûnê de dinivîsîne. Ger dê û bavê zarokê li Almanya dijîn, mafê qanûna alman ya ji bo destnîşankirina paşnav dikare were bikaranîn. Beriya belgeya jidayîkbûnê divê daxuyaniyeke nefermî were îmkirine.

Ji kerema xwe re, ger pirsên we yê taybet hebin beriya zarok jidayîk bibe serî li daîreya zewacê (Standesamt) bidin.

### Navê zarokê:

Binavkirina zarokê jî li gorî qanûna dewletê ku lê ye tê destnîşankirin.

Dê û bavê ku xwedî mafê xwedîkirina zarokê ne dikarin navekî ji bo zaroka xwe hilbijêrin. Ger tenê kesek ji dê û bav xwedî mafê xwedîkirina zarokê ye, wê demê tenê ew kes dikare navekî an jî çend navan hilbijêre.

**Ji kerema xwe re dema we navek hilbijart, girîngiyê bidin rastnivîsandina wî navî! Ji ber ku dûre ne mûmkune ku guhertin di belgeyê de were pêkanîn (Weke mînak: René, Aîşe)!**

## Qebûlkirina bavîti û mafê xwedîkirina zarokê

Ger dê û bav êdî bi hev re ne zewicî bin, navê bavê zarokê dikare tenê di belgeya jidayîkbûna zarokê de were nivîsandin dema ku bi fermî weke bav hatibe qebûl kirin. Ev yek dikare beriya jidayîkbûna zarokê jî pêk were. Nasandina bav dikare li cem daîreya zewacê (Standesamt) li cem daîreya ciwanan (Jugendamt) an jî li cem noterekî were qebûl kirin. Ji bo vê yekê, divê dayîka zarokê here li yek ji wan sê cihan û qebûl bike ku ew kes bavê zarokê ye. Tenê hingî ev yek derbas dibe. Lê dê û bav dikarin cûda cûda herin wan deverên bahskirî û bi serê xwe daxuyaniya xwe bidin.

Ger dê û bav nezewicî bin, daîreya ciwanan (Jugendamt) an jî noter ji bo daxuyaniya xwedîkirina hevbeş ya zarokê berpirsyar in.

-----

Piştî qeyîdkirina jidayîkbûna zarokê, dê û bavê zarokê wê van belgeyan ji daîreya zewacê (Standesamt) bistînin:

- Belgeya jidayîkbûne ji bo serîlêdana cem sîgorta tenduristiyê (Krankenkasse) ji bo wergirtina alîkariyê di dema tatîla kar ya dayîkiyê de
- Belgeya jidayîkbûne ji bo serîlêdana wergirtina perê dê û bavîtiyê
- Belgeya jidayîkbûne ji bo serîlêdana wergirtina perê zaroka
- Belgeya ji bo pêwîstiyên olî (helalkirina zarokê)
- Sertîfîkata jidayîkbûnê (Geburtsurkunde) ji bo deftera malbatî û pêwîstiyên din (Heqê vê yekê 14,00 €, ji bo her sertîfîkayêke din her carê 7,00 €)
- Ger zarok mecbur be li nûnertiyeke biyanî were qeyîdkirin, sertîfîkatek navnetewî ya . (Heqê vê yekê jî 14,00 € û ji bo her sertîfîkatek din her carê 7,00 €)

#### Daîreya zewacê ya li Bielefeld

**Standesamt Bielefeld**

Niederwall 23

33602 Bielefeld

Neues Rathaus, Qata 1., Korîdora F, odayên bi jimara: 103a, 105, 107, 109, 111, 113, 115, 117, 117a

Wextên vekirî: tenê ger termîn hebe. Online Terminbuchung unter: <https://tempus-termin.com/termine/index.php?anr=58>

Nimra tîlefonê: (05 21) 51-0